



Necîb Balay

nbalay80@hotmail.com

Bedel Revo û Edebiyata Biyanî

Li vê dawîyê Nivîskarê koçber ji kurdistana Başur Bedel Revo, Pertûkek bi qîmet ji edebiyata biyanî daye weşandin, ev pertûk ji layê weşanxana Spîrêz li bajarê Duhokê hatîye weşandin.

Pertûk ji 200 rûpelên qebarê navîn pêkhatîye, Pertûk bi navnîşana Gulbijêra Helebstvanên Austurî (Nemsayî) hatîye çapkirin, vê pertûkê Jiyan û hind mînakên berhemên 70 helebstvanên Austurî yên Nûxwaz di nav rûpelên xwe da hembêz kirîne,

gelek ji van helebstvanan navûbangîya xwe ya ewropî wergirtîye û xelatên jêhatî yên edebîyatê wergirtîne, ew nivîskar û helebstvanên di pertûkê da cih girtin nek bi tenê helbest nivîsandîne, belku wan

serbûreka edebî ya temam heye, wan hewil daye serbûrek taybet li gel Roman, çîrok , şano û pexşan ê jî peyda bikin, ev helbestvan û nivîskarên di pertûkê da hatîn bi rêzkirin, piranya wan di sedsala burî da dest daye nivîsandinê û gelek ji wan heta roja îro di jiyanê dane û li ser serbûr û tecrûba xwe ya helebst û edebiyatê di berdewamin, helbestvan û nivîskaren Austurî(Nemsawî) yê wekî:

Alfred Kolleritsç, Alfred Ernst Stengg, Alois Hallner, Sailer Andrea, Eriç Demmer, Eduard F Ortner, Ernst Herbeck Alexander, Ernst JANDL, Eriç Hackl, Eva Kittelmann, Ilse Tielsç, Emilie Johanna Fürst ...htd., di pertûkê da ich digirin.

Nivîskar Bede Revo, ji bo mijara pertûkê herdu nifş(Jin û mêr) hilbijartîn e, helebestên gelek jin û mêran ji zimanê Almanî wergerandîne ji bo zimanê kurdî û di vê pertûkê da çap kirîne, ev pertûk dikeve di xana edebîyata Biyanî ya werger da, mînakên helebestên vê pertûkê îmajek berfireh ya helebesta helbestvanên austurî pêşçavî xwendevanê kurd dike, ev pertûk weke

entolojîya helbestvanên Austûrî dihê hesab kirin, zêdebûna pertûkên weha gelek xizmeta pertûkaxana kurdî dikin, ji ber ku, pertukxana kurdî bi wergerên ji edebîyata biyanî gelek lawaz û hejare, ya fer li ser milên kurdên li koçberîyê dijîn ewe ku, her yek ji alê xwe ve dest bide wergerên ji zimanên biyanî ji bo zimanê kurdî,

Xwedîyê Pertûka Gulbijêra helebstvanên Austurî hêja Bedel Revo heta niha gelek têkistên edebî, ji helbest, çîrokên biyanî ji zimanê erebî û almanî wergerandîne zimanê kurdî, dîsan berovajî, wî gelek berhemên Nivîskarên kurd, yên wek helebstvan Muayad Tayîb, Abdulrehman Mizûrî, Necîb Balayî, Muhsin Quçan, ..htd ji kurdî wergerandîne zimanê Erebî û yên ewropî.

Nivîskar Bedel Revo, derçûyê Zanîngeha Edebiyatê ye li Bexdad e, beşê zimanê Russî, ew hind caran hem helbestê di nivîse û hem jî karê wergerê dike, di salên 1990an da koçberî welatê Auistûriya buye û li Bajarê Grass jiyana xwe berdewam dike, hîvîdarîn ku, pertûkên ji vî cerey di pertûkxana kurdî da zûr bibin, da ku asoyên fikra kurdan li edebîyta bîyanî berfireh bibin û pêzanînan derheqî edebîyata biyanî bi dest bixin, lê mixabin ev cure

pertûkên weha bi tenê bi kirmancî, bi tîpên
Aramî(Erebî) dihên nivîsandin piranîya
xwendvanên kurd jê bê par dimînin, ji ber ku,
wek dihê zanîn piranîya xwendevanên kurd bi
Tîpên Latînî û alfabêya Mîr Celadet di xwînin
û di nivîsin.